
*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (517) 05-05-2026




N. Hesen.Mukerem

## Bêdengiyek ku bêhna hilweşînê dide

Di êrîşên hewayî yên hevbeş ên Amerîkî û Îsraîlî yên 28ê Sibata 2026an de, Elî Xameneyî, Rêberê Bilind ê Rejîma Îslamî, û hejmarek ji berpirsên leşkerî û ewlehiyê yên herî payebilind ên rejîma terorîstperewer a Îranê hatin kuştin. Lê çîroka ku piştî wê hat, dibe ku ji êrîşê bixwe jî balkêştir û bigumantir be, çîroka rêberekî ku kesî nedîtiye, û hêzek ku di siya wî de dixebite. Meclisa Xibrigan a rêberiya Îranê, Mocteba kurê Elî Xaminey, piştî kuştina Xamineyî wek rêberê nû dest nîşan kiri....

Dom» R:4



N. Dr. Mecîd Heqî

## Komara Îslamî; Şikest di stratejiyê de, reviyana ber bi pêş ve di taktîkê

Dîroka dîktatoriyên totalîter her tim bi şêweyekî ku dubare dibe bi dawî dibe: Dema ku ambisyonên stratejîk li kevirê hişk ê rastiyê dikevin, rejîm li şûna ku şikestê qebûl bikin û guhertineke bingehîn pêk bînin, dest bi çirûskên taktîkî dikin. Komara Îslamî ya Îranê îro tam di vê xala jiyana xwe ya dîrokî de ye. Rejîmek ku zêdetirî çar dehsalan bi dirûşmeyên "hinardekirina şoreşê" û "tunekirina emperyalîzmê", sermayeyên mezin ên gelên Îranê di tenûrên........

Dom» R:5&6



N. Sefiye Xalidî

## jîyan di navbera Tirs, bindestî û hêvîya Azadiyê

Rewşa Kurdan li rojhilatê Kurdistanê gelek dijwar e. Ew bi berdewamî di navbera zilm û hêviyê de, di navbera tundûtûjî û xwesteka azadiyê de asê mane. Ji bo van kesan, ev tê wateya jiyaneke rojane ku gelek hêz û qewetê dixwaze.Ji perspektîfeke psîkolojîk ve, rûbirûbûna berdewam a bûyerên neyînî yên wekî girtin . . . .

Dom» R:10




# Mistefa Hicrî: Rejîm Gihîştiye Binbestê û Nikare Vegere Rewşa Beriya Şer



Sîmînereke siyasî-rêxistinî ji bo birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê bi amadebûna endamên Hizbê û desteya birêveberiya derveyî welat li bajarê Stromên li Norwêjê birêve çû.

Sîmîner bi sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û deqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji canê şehîdên Kurd û Kurdistanê destpê kir.

Di beşa yekem a sîmînerê de, Mistefa Hicrî axaftineke berfireh li ser rewşa rêxistinî pêşkêş kir.

Hicîrî bal kişand ser dîroka tije serfirazî ya Hizba Demokrat û tekez kir ku parastina yekrêziya navxweyî û hevahengî bi hêzên Kurdistanî re, remza sereke ye da ku gelê Kurd di hevkêşeyên siyasî yên Îranê de bibe xwedî biryar û bandor.

Sekreterê Giştî yê Hizbê ronahî xist ser destkeftiyên yekbûna malbata mezin a Demokrat û ragihand: "Vê yekbûnê ne tenê Hizb bihêztir kir, belkî moralekî mezin da xelkê Rojhilatê Kurdsitanê jî; bi vî rengî ku niha bangewaziyên Hizbê ji bo mangirtin û xwepêşandanan bi coşeke zêdetir xwe didne pêş."

Derbarê guhertinên navçeyê û piştî şerê 40 rojî yê Amerîka û Îsraîlê li dijî rêjîma Îranê, birêz Hicrî got ku rejîm gihîştiye binbesteke û nikare vegere rewşa beriya şer.

Herwiha destnîşan kir ku îhtîmaleke mezin heye rejîm ji bo mana xwe hemû mercên Amerîkayê qebûl bike, lê careke din baweriya navneteweyî bi dest naxe û dê bikeve bin çavdêriyeke tund a navneteweyî.

Di beşeke din a axaftina xwe de, Sekreterê Giştî behsa rola "Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê" kir û ragihand ku ev hevpeymanî li ser bingeha nirxandineke hûr a siyasî pêk hatiye.

Hicrî got: "Em niha di civînên navneteweyî û Parlamentoya Ewropayê de wekî dengekî yekgirtî yê neteweyî derdikevin, ku ev yek jî tirsa herî mezin di dilê Komara Îslamî de çêkiriye."

Di beşa duyem a sîmînerê de, rûniştineke vekirî ji bo pirs û dîtinên beşdaran hat veqetandin.

Di vê beşê de birêz Mistefa Hicrî û Dr. Kwêstan Gadanî bersiva hûr a pirsên siyasî û rêxistinî yên endaman dan.

# Daxuyaniya Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê li derheq Sêdarêdana «Yequb Kerîmpûr» û «Nasir Bekirzade»

Li berdewamiya pêla nû ya sêdarêdana çalakvanên siyasî û sivîl de, Komara Îslamiya Îranê 2 çalakvanên siyasî bi navên "Yequb Kerîmpûr" û "Nasir Bekirzade" bi tometên bêbingeh û neheq li sêdarê dan.

Ev tawan di demekê de têne kirin ku deshilata Tehranê di navxwe û derveyî welat de tûşî şikestinên siyasî û stratejîk bûye û dixwaze bi rêya tundûtûjiyê şikestina xwe veşêre.

Komara Îslamî ku cewherê wê li ser bingeha dîktatorî û tûndajoyiya îslamî hatiye avakirin, li Kurdistanê û li hember neteweyên bindest wekî hêzeke dagîrker reftarê dike; herwisa li hember azadîxwazan, jinan û hemû mafxwazan deshilateke totalîter û dijî mirov e.

Ji ber hindê, hikûmeta Îranê her cure dengekî mafxwaziya neteweyî, azadîxwazî û wekhevîxwaziyê û her hawareke ku dijî sîstema dîktatorî be, tenê bi girtin, êşkence û benkê sêdarê bersiv dide. Ev siyaseteke herdemî û neguher a vê rejîmê bûye li Kurdistanê, lê îro em dibînin ku bazneya vê serkutkariyê ber firehtir bûye û hemû deverên bin deselata hikûmetê girtine, bi awayekî ku niha hemû cografyaya siyasiya Îranê bûye zindaneke mezin bo azadîxwazan.

Em wek Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, tevî şermezarkirina tund a van kiryarên nemirovane, dubare dikin ku penabirin bo sêdarê nîşana lawaziya rejîmê ye ne bihêziya wê, û ev xwînên rijandî îradeya neteweya me bo gehiştina bi azadî û dadperweriyê bihêztir dikin.

Di dawiyê de, em daxwazê ji navendên mafên mirov û ramanên giştî yên azadîxwazên cîhanê dikin ku bêdengiya xwe bişkînin û bi givaşên hemûalî rêgiriyê li maşîna kuştara Komara Îslamî bikin. Pêwîst e civaka navdewletî rêgiriyê li van tawanên sîstematîk bike yên ku dijî mirovahiyê têne kirin.


Em bi biryar in li ser têkoşînê heta sernixûniya yekcarî ya vê dîktatoriyê û derbasbûn ji vê zindana mezin a ku bo rûniştvanên Îranê çê kirine; em piştrast in ku benkê sêdarê nikare rêgiriyê li karwanê têkoşînê bo rizgarî û azadiya Kurdistanê û têkoşîna rewa ya neteweya me bike.

**Nemirî bo giyangoriya û serkeftin bo rêbaza azadiyê**

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**

**2ê Gulana 2026 an**

# Di nava beraşê şerê Amerîka û Tehranê de kî çarenûsa Kurd diyarî dike?



N. Şemal Terxîbî

Bi dirêjahiya dîroka mirovahiyê, her şerek bi «biryarekê» dest pê kiriye û bi «guhertina biryarekê» jî bi dawî bûye. Ev eslê bingehîn derbarê şerê niha yê navbera rejîma Tehranê û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de jî wekî rastiyek tê dîtin, lê pirsa cewherî ji bo me Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê ew e ku Kurd di nav beraşê şerê han de, di kîjan aliyê hevkişê de cih girtiye?

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, di dehsalên borî de nîşan daye ku bêtirî ku pabendî «encama yekalîker a şeran» be, pabendî «guhertina berjewendî û pêwîstiyan» bûye; yanî Amerîka li gorî ezmûna herî kêm 60 salên borî, her çend di çendîn şerên xwînawî de beşdar bûye, lê her gava ku hest kiribe ku êdî pêdivî bi domandina şer nemaye yan jî êdî berjewendiyên wê di berdewamiya şer de nînin, dev jê berdaye û guhertin di stratejiya xwe de pêk aniye. Ji Vîyetnamê bigire heta Efxanistanê, ji Iraqê heta Sûriyê, heman plan û heman guhertina stratejîk dubare bûne; çûna nav şer bi hêzeke mezin û, derketin û bicî-hêştinek ku her dem tije ye ji pirsên bê bersiv.

Îro jî, di bin siya aloziyên zêdebûyî yên navbera Îran û Amerîkayê de û piştî şerekî 40 rojî yê dijwar ê serbazî û wêrankirina pêgehên girîng ên desthilatê li Îranê de, ew pirs dubare di mejiyê mirov de çê dide: Gelo dîrok dubare dibe?

Bersiva vê pirsê çi «erê» be çi «na», girêdayî bûyerên paşerojê ye, lê ya ku ji vê pirsê jî girîngtir e di rastiyê de ew e ku di nav vê hevkişeya nû û aloz a Rojhilata Navîn de, yek ji lîstikvanên dêrîn dubare hatiye ser şanoyê, ku Kurd e.

Dîroka peywendiya navbera Kurd û Amerîkayê, dîroka hevkariyên taktîkî ye, hevkariyên ku di demên girîng û hestiyar de çê bûne, lê pir caran di heman demê de bi dawî hatine!

Ji çiyayên Qendîlê heta deştên Sûriyê, Kurd pir caran wekî hevbeşê meydanî derketiye, lê ev hevbeşî her dem ji rastiyekê çavkanî girtiye: «Berjewendiya hêzên mezin, neguher nîne».

Di piroseya şerê navbera Amerîka û rejîma Tehranê de jî ji bo careke din Kurd hatin nav hevkişê û roleke nû wergirt; rolek ku hem derfet e û hêm metirsî!


Derfet bi wateya dîtin, xwe-dîtin û ji bo ragihandina daxwazan û ji bo hebûneke yekalîker di nav wan hevkişeyên ku paşeroja herêmê diyar dikin, lê metirsî jî, di dubarebûna heman nexşeyê de ku berê li Sûriyê xwe nîşan da, yanî bikaranîn û paşê tenê-hiştin!



Bi giştî di cîhanekê de ku siyaset bêtir ji her demê nayê pêşbînîkirin û tu piştgiriyeke hertimî nîne; di cîhanekê de ku cemserbendî û siyasetkirin li ser bingeha berjewendiyên hevbeş in û mafên mirovî dibin ewlewiyeta duyem û sêyem, belkî ne zêdegavî be ger em bêjin girîngtirîn waneya dîrokê pêk tê ji vê ku: Ew gelên ku paşeroja xwe tenê li ser biryara kesên din ava dikin, bêtir ji lîstikvanbûnê, dibin «amrazê lîstikê».

Nexwe li vir e ku gotina bi nav û deng a rêberê me yê şehîd, Dr. Qasimlo dubare xwe diyar dike û tîne bîra me ku dibêje: «Ku miletê Kurd hem ew hêza wî heye bikaribe xwe rizgar bike û hem ji faktora bîhanî wek amileke guncaw sûd werdigire, lê faktora bingehîn, ewê ku dibêjin diyarker, hêza wî bi xwe ye. Dost baş e hebe, lê di xebata me de ji bo rizgariya me, nabe em hêza xwe li aliyekî deynin û baweriya me wisa be ku dostê herî baş me rizgar dike. Nexêr. Divê em bi xwe, xwe rizgar bikin û divê em bi xwe giriftên xwe çareser bikin. Lewma em pir kêfxweş in ku piştî çend sal xebata miletê Kurd, ew fikra ku berê pir bi hêz bû li Kurdistana Îranê, ku çarenûsa gelê Kurd li Washington û London û Parîs û Moskowê diyar dibe; pir kêfxweş in ku ew hest teqrîben bi temamî ji nav çûye û xelkê Kurdistanê pir baş dizane ku ew bi xwe çarenûsa xwe diyar dike û ew çarenûs jî li Kurdistanê diyar dibe.»

# Peyama Yekîtiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê bi helkefta 12ê Banemerê




**Xelkê rizgarîxwaz ê Kurdistanê!**

**Xwendekarên dêmokrat ên Kurdistanê!**

**Xwendekarên xebatkar ên Kurd!**

Bi helkefta 12ê Banemerê, Roja “Xwendekarê Kurd”, em bi germî pîrozbahiyê li we dikin û rêzê ji xebat û têkoşîna siyasî û bandordar a we di çepera xebata ronakbîriyê de digirin.

12ê Banemera îsal, 58 sal bi ser bûyerekê de derbas dibe ku wekî rûpeleke geş di dîroka xebata rizgarîxwaziya neteweya Kurd û çalakiya xwendekaran li Rojhilatê Kurdistanê de hatiye tomarkirin û bûye îlhama xebatkar û nîştimanperweran, bi taybetî xwendekarên neteweperwer ên Kurd.

Di sala 1346an a rojî de, hejmarek ji xebatkarên Hizba Dêmokrat a Kurdistanê di bin navê Komîteya Şoreşger a Hizba Dêmokrat a Kurdistanê û bi mebesta şikandina zilmata şeva tarî ya salên çilan a rejîma paşatiya Pehlewî, çexmaxeya serhildaneke çekdarî lê dan û nav girava aram a Mihemed Reza Şahê Pehlewî çilqandin.

Di wê serhildana dîrokî de “Smaîl Şerîfzade” wekî yek ji rêberên serhildanê û wekî xwendekarekî pêgehiştî yê Kurd, roleke bi bandor li ser hişyariya neteweyî û xebata nasnamexwaziya Kurd hebû.

Smaîl Şerîfzade, pêşengê wê koma xebatkarên siyasî yên Kurd bû ku bi helwesta siyasî û lêzaniya xwe ya xebatkarî, pênaseyeke nû û nasnameyeke neteweyî da xwendekarê Kurd û têkoşîna siyasî û sînfî ya xwendekarên Kurd di zanîngehên Îranê de.

Di demekê de ku rewşa siyasî ya Îranê di dehsaleya 40î ya rojî de bi tevahî ketibû bin bandora fikra çepa radîkal ji aliyekê ve, û fikra Îranşehriyê ji aliyê din ve, hejmarek ji xwendekarên Kurd di zanîngehên Tehranê de -yek ji wan Smaîl Şerîfzade- têkiliyeke gotarî û siyasî ligel tevgera neteweyî-dêmokratîk a Kurdistanê damezirand ku bû destpêka serhildana pêvajoyekî radîkal û neteweyî di nav hinavê tevgera Kurdistanê de ku Hizba Dêmokrat rêberiya wê dikir.

Hevdem têkiliyeke me’rîfî û di heman demê de dualî di navbera çepa radîkal û neteweyiya Kurdî de hate holê ku tevgera çekdarî ya salên 46-47an di nav de ji dayik bû.

Di wê qonaxa dîroka Îranê de ku azadiyên siyasî bi tundî dihatin tepeserkirin û tu hêviyek ji bo guherîneke siyasî di wî welatî de nedihat dîtin, Şerîfzade û komek din ji ciwanên xwendewar ên wê demê, çepera xebat û têkoşînê ji zanîngeh û navenda Îranê ve bo çiyayên Kurdistanê û bo nav rêzên têkoşerên Hizba Dêmokrat veguhestin.

Ew tevî hewildana wan bo birina serê ya asta hişyariya siyasî û hizra neteweyî û bilindkirina xesleta serxwebûna siyasî di Hizba Dêmokrat de û giringîdan bi têkoşînê di navxweya Rojhilatê Kurdistanê de, bûn hevênê wegerîna serhildaneke çekdarî li dijî desthilata Mihemed Reza Şahê Pehlewî û di navbera Komara Kurdistanê heta şoreşa gelên Îranê di sala 57an de, mezintirîn bûyera siyasî ya Kurdistanê afirandin û bûn pira pêwendiya navbera wan du bûyerên siyasî li Rojhilatê Kurdistanê de.

Tevgera çekdarane ya Kurdistanê (1346-1347) yekem tevgera çekdarî bû li Îranê de ku ligel pêşwaziya germ a xelkê wêzarbûyî berbirû bû û bû destpêkek ji bo destpêkirina xebata çekdarî li navçên din ên Îranê jî.

Di encamê de roja 12ê Banemera sala 1347an a rojî, Kak Smaîl Şerîfzade û çend hawçeperên din ên wî di rûbirûbûnekê de ligel hêzên tepeserkar ên rejîma paşatî li devera Banê de şehîd bûn.

**Xwendekarên nîştimanperwer ên Kurd!**

Xwendekarên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê di serdem û qonaxa niha de jî, beşeke çalak in ji tevgera neteweyî û rizgarîxwaziya neteweya xwe. Ew li navxweya Îranê zêdebarî zilm û zordariya damûdezgehên tepeserkar ên rejîmê di nav zanîngehan û di çepera şeqamê de jî di rêza pêşya xebat û têkoşînê de bûn. Ew jî di rewşekê de ku Komara Îslamiya Îranê her ji destpêka hatina ser kare xwe ve, zanîngeh bi metirsî bo ser bingeha îdeolojîkên xwe dizanî û organ û damezraveyên curbicur ên ewlehiyê di zanîngehan de cîgir kir û hewil daye û hewil jî dide dengê azadîxwazî û mafxwaziya xwendekaran mat bike; lê zêdebarî wê jî me dît ku di pêvajoya Şoreşa Jînayê de, xwendekar di beşeke zêde ji zanîngehên Kurdistanê de bûn pêşengê wê şoreşê.

Herwisa di rojên 18 û 19ê Befranbara 1404an de xwendekarên Kurd beşdariya çalak di van nerazîbûnan de hebû û hejmareke berçav ji xwendekarên Kurd şehîd bûn.

Keç û kurên xwendekar ên Kurd di zanîngehên Îran û Rojhilatê Kurdistanê de xwest û daxwazên xwe yên civakî, aborî û siyasî di bestênê xebateke neteweyî de kirin hevênê çalakiyên xwe û koma pêkhateya siyasî û îdeolojîk a rejîmê kirin armanc.

Şoreşa Jinayê û serhildana berfireh a xwendekaran di pêvajoya wê şoreşê de ji gelek rûyan ve dirêjeya xebata şehîd Şerîfzade û hevalên wî di wê serdemê de bû û gelek xalên hevbeş di wan du qonaxan de berçav dikevin.

Ruhê şoreşgerî yê Şerîfzade û hevalên wî di rûbirûbûn û rabûn dijî sitemkarî û dîktatoriyê, derbestiya neteweyî û nîştimanî û tevlîbûn bi tevgera neteweyî û herwisa vejandina hêviya xwendekaran bi guherîna bingehîn ew wekheviyên ku çalakiyên xwendekaran di Şoreşa Jînayê de bi xebata xwendekariya dehsaleya 40î bi pêşengiya Şerîfzade pêkve girê didin.


Wê jî wiha kiriye rêbaza Şerîfzade wekî rêber û hêma û pêşengê xwendekariya Kurd berdewam berhem bêt û pêşwaziya civaka xwendekariya Kurdî ji wê navlênanê berçavtir û xuya bêt.


Yekitiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê zêdebarî evê ku bizava xwendekariya Kurdî bi bizaveke guherînxwaz, neteweyî û edaletxwaz dizane, baweriya kûr bi rêkxistina hindî zêdetir a xwendekaran heye bo biserhevxistina şiyanên wan di bûbirûbûna dîktatorî û her cure sitemekê û ji wan sitema neteweyî, regezî û çînayetî û di wê pêxemê de jî hewil dide şiyan û hêza xwe di pêxema armancên bilind ên wê bizavê de bixe kar.

Yekitiya Xwendekarên Dêmokrat a Kurdistanê tevî bi bilindnirxandina yad û bîranîna şehîd Smaîl Şerîfzade, sîmbola tevgera xwendekariya Kurd, pîrozbahiya 12ê Banemerê, Roja Xwendekarê Kurd li xwendekarên dêmokrat ên Kurdistanê, civaka xwendekarî û hemû xelkê Rojhilatê Kurdistanê dike û piştgiriya xwe ji xebata mukum û rû li geşeya xwendekarên biwêr û pêşengê civaka Kurdî dûbare dike û zanîngeh û navendên akademîk çi di berhemhênana hizr û endîşeyê û çi di warê çalakiya meydanî de bi bizivîner û pêşengê xebata cemawerî dizane.

**Yada şehîdan her zindî!**
**Serkeve xebata mukum a neteweyî we!**
**Yekîtiya Xwendikarên Dêmokrat a Kurdistanê**
**12ê Banemera 1405an a Rojî**

# Bêdengiyek ku bêhna hilweşînê dide





N. Hesen.Mukerem

Di êrîşên hewayî yên hevbeş ên Amerîkî û Îsraîlî yên 28ê Sibata 2026an de, Elî Xameneyî, Rêberê Bilind ê Rejîma Îslamî, û hejmarek ji berpirsên leşkerî û ewlehiyê yên herî payebilind ên rejîma terorîstperewer a Îranê hatin kuştin. Lê çîroka ku piştî wê hat, dibe ku ji êrîşê bixwe jî balkêştir û bigumantir be, çîroka rêberekî ku kesî nedîtiye, û hêzek ku di siya wî de dixebite.

Meclisa Xibrigan a rêberiya Îranê, Mocteba kurê Elî Xaminey, piştî kuştina Xamineyî wek rêberê nû dest nîşan kirin. Lê ev hilbijartin ji destpêkê ve bi nezelaliyên micid tijî bû. Zêdetirî şeş hefteyan piştî ragihandina serokatiya Mocteba, ti kesî ew nedîtiye û ne jî bihîstiye.

Di nav pevçûnekê de ku jiyana rejîmê xistiye bin gefê de, Xamineyî bi awayekî berbiçav ne amade bû, tenê daxuyaniyên bi navê wî li ser televîzyona dewletê hatine xwendin an jî li ser medyaya civakî hatine weşandin. Rejîmê heta vîdyoyên ku bi hişê destkird hatine çêkirin jî bikar aniye da ku nîşan bide ku Mocteba Xamineyî peyaman dide. Li vir de ye ku neynikek tarî nîşanî Tehranê dide yanî dibe Mocteba jî di gel bavê xwe yê xwînmij hatibe kuştin.

Dema ku welat yan hêzek di nav şer de be, rêber an serokê wî dewletî ji bo bilind ragirtina morala welatî û hêzên xwe her çiqas nexweş an birîndar jî bibe, hewl dide ku derkeve û bi corekê xwe nîşan bide ji bo mînak Dema ku Amerîka ket nava Şerê Cîhanê yê Duyemîn, serokê wê mirovek bû ku nedikarî bimeşe. Franklin Roosevelt, ku nexweşiya polîyoyê(felec) hebû, gav avêt da ku kêmasiya xwe ya laşî kêm bike, pir caran bikaranîna qertik û alîkariya kesên din hewl da ku hebûna xwe nîşan bide.

Ev derketin heybeta wî ya ecêb a nîşandana hêz û baweriya wî û moralê bû, yan dema ku di kursiya bi teker de jî bû, rêzgirtinek taybet ji wî re dianî. Wî qet xwe veneşart, ew di radyoyê de axivî, li ber Kongreyê derket, bi Çerçîl û Stalîn re civiya. Dibe ku laşê wî îzin nedaba, lê digel hemû zehmetiyan derdiket û diaxvî û daxuyanî didan. Di heman demê de ku Winston Çerçîl bi nexweşiyan derûnî a giran re, lê tevî van krîzên derûnî, wî karî wêneyek giştî ya biryarderî û wêrekiya bêdawî biparêze.

Çerçîl li kolanên Lendenê, di nav dûman û agir de, dimeşiya, destên mirovan dihejand. Amadebûna fîzîkî ya wî bû ku ruhê neteweyê zindî dihişt, ne daxuyaniyên nivîskî. Her du rêberan dizanîn ku di şer de, xuyabûna serok an rêber weke çekekê ye.



Çend rapor rewşa rastîn a Mocteba Xameneyî eşkere kirine. Tê gotin ku Mocteba di êrîşa 28ê Sibatê de bi giranî birîndar bûye, sê caran bo lingê wî neştegerî kirin, destekî wî hate neştegerîkirin û hêdî hêdî fonksiyona wî vedigere, rû û lêvên wî bi giranî şewitîne û ji bo wî zehmet e ku biaxive.

Balyozê Îranê yê li Qibrisê bi eşkereyî gotiye ku "Ez nafikirim ku ew di rewşek wisa de ye ku gotarekê bide." Lê Roosevelt jî nikaribû bimeşe. Çerçîl, di rojên xwe yên herî tarî de, dixwest ji her tiştî bireve dema mirov rewşên wan rêberan dide berhev guman çêdibe ku Mocteba Xaminey sax be. Cudahî ev e ku wan hilbijart ku werin. Mocteba Xameneyî ev hilbijartin nekir, an jî nikare bike.

Lê li pişt vê nebûnê rastiyek girîngtir heye. Guman zêde dibin ku dibe ku Spaha Pasdaran a terorîst hêza rastîn be ku rê li ber desthilatdariyê digire, û Xameneyî bêtir wekî kesayetek bêdeng û sembolîk dilîze ne wekî biryarderek çalak.

**Li gorî raporan, spaha pastaran Meclisa Xibrigan han daye ku Mocteba wekî rêber hilbijêrin, û tevî mirina rayedarên rejîmê yên li pey hev di şer de, Spaha Pasdaran a terorîst (IRGC')ê rol û bandora xwe li ser pêkhateya siyasî ya Îranê berdewam kiriye.**

"Mocteba ne di rewşekê de ye ku biryarên krîtîk bide yan jî hatibe kuştin, lê dezgeh wî bikar tîne da ku pejirandina dawî li ser biryarên girîng bistîne," û "vegotina nêrînan ji Mocteba re ji bo danûstandkarên Îranî kêmekê baş e ku xwe ji rexneyên navxweyî biparêzin."

Di dîrokê de mînakên hene ku serokê nominal pişta perdê bûne, û hêza rastîn li cîhekî din bûye. Lê cudahiya girîng ev e ku wan desthilatan bi gelemperî ev yek di aştî an serkeftinê de dikirin.

Spaha Pasdaran vê yekê di nîvê şerekî berfireh de encam dide, şerek ku hezaran welatî û hêzên çekdar hatine kuştin û pêşeroja tevahiya herêmê xistiye gumanê. Bi jinavçûna fermandarên payebilind re, hêzên çekdar yên Îranî serî li stratejiyeke "parastina mozaîk" dane ku desthilatdariyê dihêle ji fermandarên herêmî re, û pirsên din di derbarê asta desthilatdariya rastîn a Xameneyî de derdixe holê.

Roosevelt di kursiya bi teker "Lançêr"ê de Şerê Cîhanê yê Duyem qezenc kir. Çerçîl bi nexweşya derûnî Lenden ji bombeyan rizgar kir. Wan ev kir ji ber ku ew xuya bûn. Lê Mocteba Xameneyî xwe veşartiye û li ti cuhî diyar nine: Rêberek birîndar an nexweş ku xuya dibe îlhamê û moralê dide, lê rêberek ku veşartî dimîne nîşana hilweşîn û mirinê ye.

# Komara Îslamî; Şikest di stratejiyê de, reviyana ber bi pêş ve di taktîkê de



N. Dr. Mecîd Heqî




Dîroka dîktatoriyên totalîter her tim bi şêweyekî ku dubare dibe bi dawî dibe: Dema ku ambisyonên stratejîk li kevirê hişk ê rastiyê dikevin, rejîm li şûna ku şikestê qebûl bikin û guhertineke bingehîn pêk bînin, dest bi çirûskên taktîkî dikin. Komara Îslamî ya Îranê îro tam di vê xala jiyana xwe ya dîrokî de ye.
Rejîmek ku zêdetirî çar dehsalan bi dirûşmeyên “hinardekirina şoreşê” û “tunekirina emperyalîzmê”, sermayeyên mezin ên gelên Îranê di tenûrên şerxwazî û serpêhatiyên herêmî de şewitand, niha di piştlerzên şerekî wêranker û di dorpêça krîzên kûr ên navxweyî û derveyî de, qopiya stratejîk bi temamî winda kiriye.

Tiştê ku em îro di reftarên siyasî, dîplomatîk û aborî yên Tehranê de dibînin, ne nîşaneya desthilatdariyê, belkî “reviyana ber bi pêş ve di taktîkê de” ye ji bo veşartina “şikesteke mutleq di stratejiyê de”.

Lêkolîna geşedanên dawî, ji danûstandinên herêmî bigire heta hilweşîna hêdî ya aboriyê û hilweşîna navxweyî ya bloka desthilatê, wêneyekî zelal ji rejîmekê dide ku tenê ji bo mayîna xwe ya rojane şer dike û ti pêşdîtineke zelal ji bo paşerojê nîne.

**Danûstandinên Îslamabadê: Manovreke biçûk ji bo kirîna demê**

Piştî bidawîbûna pevçûn û şerê ku makîneya propagandayê ya rejîmê hewl da wekî serkeftineke epîk bi bingeha xwe ya civakî ya ku ber bi hilweşînê ve diçe bide qebûlkirin, rastiyên meydanê tiştekî din nîşan dan.
Civîn û danûstandinên ku van dawiyan di bin navê “Danûstandinên Îslamabadê” de pêk hatine, tam di vê çarçoveyê de tên nirxandin.
Komara Îslamî di van danûstandinan de li çi digere?
**Bersiv hêsan e:** Kirîna demê û sererastkirina rewşa aloz a piştî şer. Tehran baş dizane ku hevsengiya hêzê li herêmê êdî ne di berjewendiya wê de ye. Binesaziyên wê yên leşkerî û hêzên wê yên wekaletê zirarên mezin dîtine û şiyana wê ya lojîstîk gihîştiye asta herî kêm.

Beşdarbûna di danûstandinên Îslamabadê de ne ji ber îradeyeke dîplomatîk a bo aştiyê, belkî manovreke taktîkî û reviyana ber bi pêş ve ye, ji bo ku belkî bi riya dîplomasiya veşartî û eşkere, derfetekê ji bo ji nû ve avakirina makîneya zext û destwerdanê peyda bike.

Lê ev taktîk, stratejiya şikestî ya rejîmê ya ji bo bûyîna hejmona herêmê telafî nake. Cîhan û welatên herêmê destê Tehranê xwendine û ev kirîna demê, tenê dibe sedema dirêjtirbûna êşa xelkê Îranê û îzolasyona zêdetir a welêt.

**Nameya ku Tehran hejand; Şerê gurran di kuncikên tarî yên desthilatê de**

Şikesta di stratejiya derve de, tavilê parçeyên xwe yên şer avêt navenda hişk a desthilatê. eşkerekirina “nameya ku Tehran hejand” û perdehilanîna ji şerê veşartî û dijwar di astên bilind ên sîstemê de li ser danûstandina bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re, nîşaneya lûtkeya bêhêvîbûn û şeqama di avahiya serweriyê de ye.

Ev nameya pir-veşartî ku dîroka nivîsandina wê vedigere dawiya meha Nîsana 2026-an û rojên piştî dawîbûna şer, ji aliyê komek endamên payebilind ên Şêwra Bilind a Ewlekariya Neteweyî û çend fermandarên payebilind ên di nav beşa Pasdaran de hatiye amadekirin û bo navenda biryardanê ya sîstemê hatiye şandin.

Di naveroka vê nameyê de, şandevan bi pêşkêşkirina raporeke hejandî û amaran ji rewşa xirab a lojîstîkî, ji hev ketina aborî û nekarîna dabînkirina lêçûnên ewlehiyê piştî şer, bi eşkere hişyarî dane ku şiyana makîneya zextê û mayîna rejîmê bi mûyekê ve girêdayî ye.
Wan di vê nameyê de tekez kirine ku tenê rêya pêşîgirtina li hilweşîna mutleq û lezgîn a sîstemê li hember bayê serhildanên girseyî, danîna alî ya dirûşmeyên îdeolojîk û destpêkirina bêşert û merc a danûstandinên rasterast bi Washingtonê re ye, ji bo kirîna demê û kêmkirina zextên navneteweyî.

Salên dirêj e ku Elî Xaminêyî, rêberê kuştî yê rejîmê, û tevahiya Pasdaran, danûstandina bi Amerîkayê re wekî xeta sor û tabûya ku nayê şikandin a sîstemê nasandin e.

Lê niha, zexta giran a dorpêçan, îflasa aborî û tirsa ji serhildanên girseyî, beşên bloka desthilatê gihandiye wê encamê ku bêyî teslîmbûna li hember rastiyên navneteweyî û vexwarina “cama jehrê” ya din, hilweşîna sîstemê hetmî ye.

Ev nameya nakok û rêzkirina alîgir û dijberên veşartî yên danûstandinê, diselmîne ku yekdengiya xeyalî ya serweriyê dereweke mezin e.

Gava stratejiya mezin a “berxwedan û nihêrîna li rojhilat” li dîwarê betonî dikeve, taktîk dibin cihê nakokiyê. Ev şerê veşartî, ne ji bo berjewendiya gelên Îranê, belkî tenê ji bo dîtina rêyekê ye ji bo rizgarkirina rejîmeke ku di bin avê de dimîne.

**Hilweşîna hêdî ya aboriyê: Bacê ku gel didin**

Ti stratejiya siyasî bê piştgiriya aborî namîne.
Gelo aboriya Îranê di rêya hilweşîneke hêdî de ye?
Bersiv di nihêrîna her çavdêrekî dadmend de, “erê”yeke tekez û biêş e. Komara Îslamî di dirêjahiya dehsalên borî de, li şûna pêşketina domdar, aboriyeke rantxwer, mafyayî û leşkerî ava kiriye ku tenê erkê wê dabînkirina darayî ya makîneya zextê li navxwe û girûpên niyabetî li derve bûye.

Aborînas li ser vê bawerê ne, aboriya Îranê êdî ne li ber devê newalê ye, belkî di ketina azad de ye.

Enflasyona bêkontrol, daketina bêwêne ya nirxê pereyê neteweyî, tunebûna çîna navîn û belavbûna feqîriya mutleq di nav piraniya civakê de, nîşaneyên nexweşiyeke kronîk nînin, belkî nîşanên mirina mêjî ya sîstemeke aborî ne.

Lêçûnên giran ên şer û serpêhatiyên piştî wê, xezîneya welêt vala kirine.

Dom» R:6

Doma» R:5

Rejîm bi çapkirina pereyên bêpiştgirî û destavêtina berîka xelkê (bi riya bacên giran û borsayê), mijûlî talankirineke rêxistinkirî ye. Ev hilweşîna hêdî, qelsiya herî mezin a rejîmê ye.
Gava sifrika gel vala bin, ti manovreke taktîkî û ti propagandayeke medyayî nikare ewlehiya pûç a sîstemê misoger bike. Aboriya Îranê ayineyek e ku şikesta stratejiyên mezin ên Komara Îslamî bi bêrehmî nîşan dide.

**Ayineya pendwergirtinê**
Yek ji bingehên sereke yên stratejiya Komara Îslamî, afirandina kûrahiya stratejîk bi riya komên wekaletê yên wekî Hizbullah a Libnanê bûye. Lê îro, nihêrînek li rewşa xirab a Hizbullahê li Libnanê, wêneyekî sembolîk ji paşeroja Komara Îslamî bixwe xêz dike.

Hizbullah a Libnanê ku rojekê bi pere û çekên Tehranê li Libnanê dewlet di nav dewletê de ava kiribû û wekî baskê bihêz ê "Eniya berxwedanê" dihat naskirin, îro hem di qada leşkerî de derbeyên bêveger xwariye û hem jî di nav raya giştî ya Libnanê de wekî sedema sereke ya wêranî û rojreşiyê tê naskirin.

Şibahiya çarenivîsa vê koma çekdarî bi piştevanê wê yê sereke li Tehranê balkêş e. Her du avahî, bi piştrastbûna li ser îdeolojiya firqeyî û tundûtûjiyê, li şûna avadaniyê, wêranî bi xwe re anîn û niha rastî nefretiya giştî hatine.

Hilweşîna heybeta Hizbullahê, di rastiyê de şikesta stratejiya herêmî ya Xamineyî ye. Gava şax û pelên vê darê jehrî li herêmê hişk dibin, rehên wê li Tehranê jî nikarin sax bimînin.




**Xeyalek bi navê sererastbûnê**
Gelek analîstên sadelûh an jî yên ku dixwazin rewşê nerm bikin, hertim vê pirsê dikin ku gelo rejîma Îranê piştî xwarina derbeyên giran û bidawîbûna şer, dê reftarên xwe biguherîne? Gelo dê bibe lîstikvaneke normal di sîstema navneteweyî de?
Bersiva vê pirsê pêwîstiya wê bi naskirina xwezaya Komara Îslamî heye. Ev rejîm ne hikûmeteke normal e ku li gorî berjewendiyên gel reftarê bike; belkî firqeyeke îdeolojîk û leşkerî ye ku nasnameya wê bi afirandina krîzan ve girêdayî ye.

Guhertina reftarê di siyaseta derve de û teslîmbûna li mafên mirovan li navxwe, ji bo Komara Îslamî bi wateya redkirina felsefeya hebûna wê ye. Lewma, rejîm piştî şer guhertina stratejîk nake.

Ew tenê taktîkên xwe diguherînin; dengê dîplomatên wan dibe ku hinekî nermtir bibe da ku di danûstandinên wekî Îslamabadê de îmtiyanan werbigirin, lê makîneya bidarvekirinê li girtîgehên navxweyî û zexta li ser gelên bindest qet ranaweste.

Reviyana ber bi pêş ve di taktîkê de, tam bi vê wateyê ye: parastina rûyê nermbûnê li derve, ji bo zêdekirina zextê li navxwe.

**Berxwedana navxweyî**
Di demekê de ku rejîm di qada derve û aborî de rastî binbestê tê, eniya navxweyî wekî gefa herî mezin bo mayîna wê tê hesibandin. Herêmên piştguhxistî û gelên bindest li Îranê, hertim pêşengê têkoşîna li dijî vê dîktatoriyê bûne.

Kurdistan, Sîstan û Belûçistan û Ehwaz, ligel kolanên Tehran, Îsfehan û Şîrazê, bûne xelekên girêdayî yên zincîreke mezin a serhildana sivîl û berxwedanê.

Rejîm hewl dide bi mîlîtarîzekirina van herêman û bidarvekirinên komî, tirsê çêbike, lê gava stratejiya tirsandinê fonksiyona xwe winda bike, taktîka bidarvekirinê tenê dibe benzîn li ser agirê hêrsa giştî.

Civaka Îranê îro qonaxa tirsê derbas kiriye û bi zelalî dibîne ku emperator ne tenê kinc li ber nîne, belkî di qelsîtirîn xala xwe ya dîrokî de rawestiyaye.

Komara Îslamî ya Îranê, îro tiştekî din nîne ji bilî avahiyeke xerabûyî, îflaskirî û di gendeliyê de fetisî.
Stratejiya hinardekirina şoreşê gihiştiye binbestê û li şûna ku bibe hêzeke bêhempa, Îran kiriye welatekî îzolekirî, feqîr û bêparastin.

Hemû liv û tevgerên ku îro ji Tehranê dibînin - çi rûniştina li ser maseya danûstandinan li Îslamabadê, çi nameniîsandinên veşartî yên tijî tirs di korîdorên desthilatê de, çi hewldana ji bo veşartina pîvanên hilweşîna aborî û çi çirûskên ji bo rizgarkirina bermayiyên Hizbullahê - hemû mînaka zelal a "reviyana ber bi pêş ve di taktîkê de" ne.

Lê dîrokê fêrî me kiriye ku ti rejîmek nikare bi taktîkên demkî, ji bin barê şikesteke stratejîk a mezin xwe xilas bike.

Gelê Îranê, wekî opozîsyoneke yekgirtî li navxwe, li benda xeletiya dawî ya vê sîstemê ye.

Hilweşîna hêdî dest pê kiriye û şeqên ku li ser bedena sîstema Welayetê Feqîh derketine, êdî bi ti çespê taktîkî û dîplomatîk nayên çareserkirin. Reviyana ber bi pêş ve, tenê rêya hilweşînê ji bo wan kurttir dike.

Paşeroja gelên Îranê, ne di kuncikên tarî yên danûstandinên veşartî yên rejîmê de, belkî di îradeya gelên ku biryar dane xeta dawî li vê xwarbûna dîrokî bikişînin, dê were diyarkirin.



## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicrî”:**

**“Rejîm Gihîştiye Binbestê û Nikare Vegere Rewşa Beriya Şer”**



**“Donald Trump”:**

**“Em dê Îranê ji ser rûyê erdê rakin”**



**“Lindsey Graham”:**

**“Heke Îran paşve nekişe, divê Amerîka karê xwe tewaw bike”**



**“Enver Qerqaş”:**

**Rejîma Îranê rêya dijminatiyê li dijî cîranên xwe hilbijartiye, û em ê nehêlin ku zêdebûna aloziyan ji aliyê Îranê ve têkiliyên pêşerojê yên li herêmê şekil bide.”**

# Îran nikare Îsraîlê lê ji bo razîkirina alîgirên xwe êrîşê dike ser sivîlên Başûrê Kurdistanê



**N. Eskender Ceiferî**



Rêjîma Îranê bi êrîşên xwe yên bi hajek û dronan nekarî derbeyek bi bandor li Îsraîlê bide. Piraniya êrîşan ji aliyê Îsraîlê ve hatin astengkirin û bêbandorkirin, û rêjîmê nekarî weke ku dixwast hêza xwe ya leşkerî nîşan bide. Vê têkçûna eşkere rêjîma Îranê xistiye rewşek qels.

Ji bo qerebûkirina vê têkçûnê û ji bo razîkirina endamên Sipaha Pasdaran û alîgirên xwe yên tundrew, rêjîma Îranê niha berê xwe dide armancên hêsantir û qelstir û êrîşî Başûrê Kurdistanê dike. Ev siyaseta rêjîmê û berdewamiya piştevanita Îranê ji bo komên çekdar, nîşan dide ku qelsiya li ser herêmê û metirsiya komên têrorîstî zêdetir dibe. Îran jî li şûna ku rastiya bêhêziya xwe li hember hêzên mezin qebûl bike, êrîşê dike ser Kurdan.

Ev serpêhatiya nû, berdewamiya rasterast a heman êrîşa li ser Îsraîlê ye. Rêjîma Îranê nikare derbeyek rastîn li Îsraîlê an Dewletên Yekbûyî bide, ji ber vê yekê ew ber bi Başûrê Kurdistanê ve çûye da ku hêza xwe ya riwalet biparêze û rê li ber nerazîbûna navxweyî ya di nav Sipahê û bingeha wê ya îdêolojîk de bigire. Ev êrîş ne tenê metirsî li ser ewlehiya herêmê ye, lê di heman demê de çavkaniyên darayî yên mezin ên ku yên xelkê Îranê ne jî, ji bo armancên din dide mezaxtin. Dema ku welatiyên Îranê rastî hejarî, daketina nirxa pere, bêkarî û krîza debara jiyanê tên, rêjîm bi milyaran dolar li hajekek, dron û operasyonên êrîşkar xerc dike ku tenê dibe sedema goşegirbûna zêdetir û zexta aborî ya berfirehtir.

Êrîşa li ser Îsraîlê bi hajeekên balîstîk ên cûrbecûr wekî Shahab-3 û Xêyber-Şikên, û dronên Şahid hate kirin, lê li ser rûyê erdê, negihîşt armancên xwe yên sereke. Ev têkçûna leşkerî givaşek mezin li nav alîgirên rêjîmê kire ser wê. Li şûna ku rastiyê qebûl bike û balê bikişîne ser pirsgirêkên navxweyî, rêjîmê biryar da ku bi êrîşkirina başûrê Kurdistanê hêmaya “hêzê” ji bo Sipahê û alîgirên wê biparêze. Dema ku rêjîma Îranê li hember dijminên rastîn bêhêz dimîne, ew ber bi armancên piçûktir û hêsantir ve diçe da ku ji alîgirên xwe re bêje ev rêjîm hêj serbilind e. Kiryarên weha ne ji desthilatdariyê, lê ji qelsiya navxweyî û bêhêziya rêjîmê têne kirin. Ji ber ku ti hêzeke mezin, sivîlan nake armanc.

**Bi salan e ku rêjîma Îranê pêşxistina makîneya xwe ya leşkerî û operasyonên derveyî welat pêş dixe. Budceyên leşkerî yên mezin têne xerckirin. Ev jî di demekê de ye ku xelkê Îranê ji pirsgirêkên bingehîn ên debara jiyanê aciz bûne.**

Dibistan xirab in, nexweşxane bi kêmbûna dermanan re rû bi rû ne, ciwan bêkar in, û nirxa diravê Îranê berdewam dadikeve. Lêbelê, li şûna çareserkirina van krîzan, rêjîm pereyên xelkê, tenê ji bo razîbûna demkî ya endamên Sipahê dide mezaxtin. Êrîşa li ser başûrê Kurdistanê mînakek eşkere ya vê siyasetê ye; operasyonek ku lêçûna wê rasterast li ser milê xelkê Îranê ye. Xelkê Îranê ne ji van êrîşan sûdmend e û ne jî bi wan razî ye.

Li hundirê Îranê, zext û givaşên mezin li ser xelkê berdewam dikin. Her dengek nerazîbûnê bi girtin, îşkence û darvekirinê tê bersivandin. Jin, ciwan û neteweyên cuda ji van siyasetan herî zêde êş kişandine. Rêjîm berdewam tengezariya derveyî diafirîne da ku daxwazên navxweyî paşhuh bike. Ev taktîk xelkê Îranê dike qurbaniyên sereke. Ew in yên ku rastî daketina nirxa pereyên Îranê tên û ziyan li wan dikeve.

Êrîşa li ser başûrê Kurdistanê ewlehiya herêmî jî xistiye metirsiyê. Rêjîm bi şandina çekan bi rêya qada hewayî ya welatên cîran, nebûna aramiyê jî berbelav dike. Ev kiryar nîşan didin ku rêjîma Îranê, li şûna parastina berjewendiyên netewî, dixwaze hêza xwe ya îdêolojîk biparêze û mejiyê alîgirên xwe têr bike. Dema ku ew nikare li armancên sereke wate li Îsraîlê bixe, ew berê xwe dide Başûrê Kurdistanê da ku bêhêziya xwe veşêre. Ev siyaseta wêranker, Îranê di çavên cîhanê de wekî sedema sereke ya nebûna ewlehiyê li Rojhilata Navîn nîşan dide û pêşeroja aborî û siyasî ya welêt hîn tarîtir dike.

Xelkê Îranê û herwisa Başûrê Kurdistanê qurbaniyên sereke yên van kiryaran in. Xelkê Îranê ne tenê ji pirsgirêkên aborî aciz in, lê di heman demê de neçar in ku bedela têkçûnên leşkerî yên rêjîmê li dijî Îsraîlê û operasyonên li Başûrê Kurdistanê bidin. Dema ku rêjîm basa “serkeftinê” dike, ew rastiya jiyana mirovan li wir, nebûna aramiyê û bêhêvîtî ye. Ciwan li Îranê, yên ku hêviya pêşerojek çêtir dikin di nav polîtîkayên êrîşkar ên rêjîmê de asê mane. Bi bêhêzbûna li hember hêzên rastîn, ev rêjîm qelsiya xwe li ser gelê herêmê derdixe.

Bi vê reftarê, rêjîma Îranê rê li ber goşegirkirin û krîzê ji bo vî welatî vekiriye. Her êrîşeke nû sizayên nû tîne û zextê li ser jiyana welatiyan zêde dike. Êrîşa li ser Başûrê Kurdistanê jî piştî têkçûna êrîşa Îranê li ser Îsraîlê, careke din selimand ku stratejiyeke rastîn a rêjîma Îranê nîn e û tenê bi mayîndebûna desthilatdariyê û razîkirina bingeha xwe ya îdêolojîk ve girêdayî ye. Ev serpêhatî ne tenê zirarê didin ewlehiya herêmê, lê di heman demê de pêşveçûn û pêşkeftina Îranê jî dereng dixin.

Berdewamiya van siyasetan ji hêla rêjîma Îranê ve metirsiyên mezin dike ser pêşeroja vî welatî. Mafê neteweyên Îranê ye ku hikûmeteke wan hebe ku li şûna ku pereyên wan li hajekan û operasyonên derve xerc bike, li debara jiyana xelkê, aborî û azadiya veberhênanê bide mezaxtin. Heya dema ku rêjîma Îranê vê fikra qels û wêranker bişopîne, xelkê asayî dê bedêla herî zêde bide.

**Di hejmara vê carê ya Rojnameya Agirî de me digel Ebdulezîz Qasim Siyasetvan li ser alozyên dinavbera Amerîka û Îranê, gefên wan her du welatan hevpeyvîn encamp daye.**



Hevpeyvîn: Ebdulezîz Qasim - Siyasetvan

Hevpeywînkar: Sîmîn Rûhanîzadeh

**1- Li gorî aloziyên di navbera Îran, Amerîkayê û Îsraîlê de, û hebûna ew agirbesta demkî, gelo divê ev agirbest wek nîşaneya kêmkirina aloziyan were dîtin, yan jî tenllê “sekinandinek taktîkî” ye ji bo nû ve bihêzkirina leşkerî û ewlehiya hewce bo her du aliyên?**

Bi dîtina gelek şirovekarên siyasî, hebûna rêjîma Îranê bi xwe, wekî gef û aloziyek mezin li ser ewlehiya deverê tê dîtin, nexasma ku ev rêjîm bi dirêjahiya 47 salan pabend nebûye bi rêkeftinên navdewletî yên derbarî bernameyê etomî, mafên mirov, destêwerdana derekî û piştgirtiya milîsên terorîst..., lewra hîç agirbestek yan rêkeftinek bi vê rêjîmê re naçê serî, û her di vê çarçoveyê de, ev agirbest niha ya heyî bi agirbestek demekî û taktîkî tê dîtin û nayê bi wateya rawestandina şer, belkû tê bi wateya kontrolkirina şer, ku Îran hewl dide vî şerî berbi şerekî cîhanî yê berfireh bibe, ku her ji destpêkê hewl daye ku hindek dewletên Erebî û Herêma Kurdistanê tevlî vî şerî bikin, bi piştgirtiya milîsên xwe yên li Îraqî û Hizbulahê bo pêkanîna êrîşan li ser navendên stratîjîk yên Amerîka û Israelê di çarçoveyê siyaseta berfirehkirina şer de, nemaze piştî daxuyaniyên tund ji aliyê Tirkiyê û Pakistanê li hember beşdariya Kurd û Belûçan di şerê rûxandina rêjîma Îranê de.

Ji ber vê yekê, bi dîtina min, ku ev agirbest pitir xwestekek demkî nîşan dide, ku Amerîka hewl dide xwe ji şerekî berfireh dûr bike, yan hewl dide siyaseta xwe ya paşerojê li deverê gav bi gav pêkbîne, û rêjîma Îranê piştî ziyanên leşkerî yên mezin,ji aliyê xwe ve hewl dide ku şiyanên xwe yên leşkerî dubare bike û ji nû xwe organîze bike, û ev yek rastiya armancên rêjîma Îranê diyar dike, ku ew amade nîne bibe beşek ji aştiyek berdewam, tevî ku gelek kartên wê yên derve li Libnan û Yemen û Sûriyê hatine şewtandin, ji ber vê yekê ev agirbesta heyî agirbestek lawaz e, ku wekî “rawestanek taktîkî” tê dîtin, nemaze ku piştî dorpêçkirina tengeva Hormozê dibe ku yasa û zagon û armancên şer bêne guhertin.

**2- Di sinaryoya zêdekirina pevçûnan de, rola Tengava Hormozê heta çi qasekî dikare wekî amûra zextê ji aliyê Îranê ve bixebite, û gelo girtin an jî newekirina wê zêdetir zirarê dide aboriya cîhanî an di dawiyê de Îran hebxwe dikeve nava zirarên tundtir û zêdetir?**

Kurtukurmancî; Rêjîma Îranê bo man û hebûna xwe, herwisa sivikirina barê xwe, bi her awayekî dê hewl bidê ku vî şerî berbi şerekî cîhanî yan herêmî yê berfireh bibe, û bikaranîn tengava hurmiz ku yek ji giringtirîn tengavên stratîjîk yên aboriya navdewletî li cîhanê ye, tê bi wateya ku rêjîma Îranê dê tengava Hormozê wekî qorixkariyek siyasî-aborî (Political Coercion) bikar bîne bo pêdagiriya li ser berdewamiya meyandina oranyûmê û nûjenkirina bernameya xwe ya nuklerî û mûşekî, herwisa bo zêdekirina hejmongeriya xwe ya herêmî, û heta astekî li ser dewletên Ewropayê jî.

Bi dîtina min, rêjîma Îranê wê berdewam bimîne li ser astengîkirina hinartina gaz û petrolê, dê tengava hormoz ne tenê wekî karteka fişar û zextê bikar bîne, lê zêdetir dê wekî kartek stratîjîk li ser abûriya cîhanî bikar bîne, herweha bo berfirehkirina şer berbi şerekî cîhanî û guhertina yasayên navdewletî derbarî tengav û derbend û korîdorên deryayî.

Bi dîtina min armancên metirsîdar li pişt astengîkirina tengava hormozê hene, û herwisa rehendên navdewletî û herêmî yên kûr û dûr jî hene ku Îran dê berdewam be li ser berhemhênana alozî û krîzên zêdetir, nemaze ku bihayê petrolê gelekî bilind bûye di nav bazarên navdewletî de, bi taybetî di bazarên Ewropayê de, di dema ku nakokî di navbera Amerîka û dewletên NATO de zêdetir dibin, bi taybetî piştî astengîkirina tengava Hormozê, ku Ewropa piştî Şerê Rusya-Ukraine, alternativek bo peydakirina gaz û petrolê bi rêjeyek pitir ji 30% nîne (li gor raportên aborî).

**3- Li gorî ezmûnên berê yên li herêmê, sênaryoyên pêşerojê kîjan nin: pevçûna rasterast û berfireh, şerê niyabetî yê kontrolkirî, an vegerê ser maseya danûstandinê? Û her yek ji van senaryoyan çi encam hene ji bo balansa hêzê li Rojhilata Navîn?**



Goman têde nîne, ku rêjîma Îranê nêzîk yan dûr dê birûxêt û dibe ku senyaroyek çavrênekirî yan pitir ji senyarok ji aliyê Amerîka û Israel hebe, cuda ji senyaroya li Sûriyê, senaroya herî tê pêşbînîkirin ku Amerîka dê pitir fişarên aborî bikar bîne bi rêya sepandina dorpêçeke deryayî heta ku Îran neçar bibe xwe radest bike, herweha ku dorpêça deryayî bi awayekî şer berbi dewletên Erebî kêm dike, ji aliyek dî rê digire li bizavên Îranê yên aborî ji jinavbirina şiyanên Îranê bo nûjenkirina sîstema xwe ya deryayî û esmanî û dezgehên etomî û mûşekên balistîk.

Agirbest niha nayê bi wateya aştiyê, zêdebarî ku pêdiviya aştiyek mayînde bi rêkeftinên mezin li ser astên (ewlehî, siyasî, etomî, aborî, herêmî) heye, tevî ku berjewendiyên Îsraîlê naguncin, ligel berjewendiyên rêjîma Îranê û nejî ligel berjewendiyên hindek dewletên herêmî wekî Pakistan û Tirkiyê û Erebistana Sûdiyê, ku Îsraîl wekî aktorekî serekî razî nabe bi hebûna rola Pakistan û Tirkiyê di paşeroja Îranê de.

Lê tê çavrêkirin ku ji aliyê çend dewletên herêmî wekî Tirkiyê û Pakistan û Ezerbican û Îranê hewl li dijî Kurd û Bilûç hebin, nemaze ku Tirkiye dê hewl bide ku rolek wê hebe di paşeroja Îranê de, wekî heman destêwerdana wê di Rojavayê Kurdistanê de, dibe ji bo armancên xwe û dê hin girûp û aliyan bikar bîne, lewra metirsiya herî zêde dê li ser deverên kurdî yên li ser sînorên Tirkiyê be, herwisa metirsiya milîsên Îraqê jîli ser deverên din yên Rojhelatê Kurdistanê heye.

Dibe ku Kurd û Bilûç rastî komkujiyan bibin, nemaze ku çend nîşan hene li ser peydabûna hevpeymaneke nehênî di navbera Enqera û Taran û Bexda de bo dijberiya pêşketina doza neteweyî ya kurdî li Rojhelatê Kurdistanê dikin, nemaze digel zêdebûna êrîşên esmanî yên rêjîma Îranê û milîsên wê yên li Îraqê li ser Hewlêrê û baregeh û kampên Rojhelatê Kurdistanê yên li Herêma Kurdistanê.

**4- Heke alozî berdewam bike an jî agirbestek hebe, ev rewş çi bandorê li ser meşrûiyet û seqamgîriya navxweyî ya hikûmeta Îranê heye? Gelo zêdekirina krîza derveyî dikare bibe sedema yekbûna navxweyî, an jî berevajiyê wê pirsgirêkên siyasî û civakî kûrtir dike?**

Wekî bûyerên 47 salên borî nîşan didin, ku rêjîma Îranê bi hîç awayekî nûneratiya hemû gelên Îranê nakê, bi taybetî ku rêjîmê paş Şoreşa “Jin jiyan Azadî” ti meşirû’yet nemaye.

Helbet îro bi sedema têkçûna rewşa aborî ya Îranê, dê dengê nerazîbûna xelkê Îranê li hember siyasetên vê rêjîmê zêdetir bibe, nemaze ku rêjîm hêşta berdewam e li ser stem û serkutkirin û bidarvekirina çalakvanên sivîl.

Bi kurtî dikarim bêjim: heke zextên aborî û leşkerî berdewam bikin, dê nerazîbûna gel zêdetir bibe û krîza navxweyî kûrtir bibe, lê bi baweriya min bêyî piştevaniya navdewletî, bi tenê nerazîbûna xelkê Îranê sernakeve û dê rêjîm berdewam be li ser kuştin û bidarvekirina keç û ciwan û çalakvanên kurd.

**Gelek spas ji boy bersivdana cenabê te kekê Ebdulezîz Qasim**

# Dadperwerî di qesabxanê de û ber devê kêrê



N. Serbest Urmiye

Di ramana kilasîk a siyasetê de, dadgeh wekî perjîna hejaran û pêwerê meşrûîyeta desthilatê tê nirxandin. Lê dema ku sîstemên siyasî man û nemana xwe di afirandina tirs û sahmê de şirove dikin, têgehên weke dadperwerî û mafên hemwelatîbûnê, tûşî çarenivîseke hovane dibin. Dosyayên kesên weke Mêhrab Ebdulahzade, Nasir Bekirzade û Yeqûb Kerîmpûr, sembola ji nû vegeriyana karesatê ne di sîstemên ku tê de çarsitûnên dadperwerî û dozgeriyê amûrên serkut û trîbûnên mirinê ne. Ew gorîyên sîstemekê ne ku tê de deq û madeyên yasayê, qamçiyên şikandina pişt û darê kêşana riha civak û yasayê ne.

**Ji serweriya yasayê ve ber bi serweriyê bi ser yasayê de**

Hêleke zirav di navbera van her du têgehan de heye ku sînorê navbera demokrasî û sîstema zordest dide xuyakirin. Di sîstemeke mirovhez de, yasa bi ser her kesî îca (ji mîran bigire hera feqîran) ve serwer e; lê di pêkhateyên totalîter û zordest de, desthilat ji yasayê weke amûrekê ji bo jinavbirina dijberan mifahê werdigire. Di vê pêvajoyê de, desthilata dadwerî ji pêgeha dadwerê bêalî derdikeve û dibe milê bihêz yê saziyên ewlehiyê. Gava serxwebûn ji dadweriyê were zevtkirin, dadgeh êdî ne cihê selimandina rastiyê ye, belkû dibe tayek ji dezgehên ewlekariyê ji bo çespandina desthilatdariyê.

**şiroveya şanoyeke mafperweriyê**

Di pêvajoya guherîna dadgehê de bo amûra fetisandine, hin pirensîbên bingehîn ên mafxwaziyê tên binpêkirin:

Bêparkirin ji mafê dozgeriya dadperwer: Li gorî madeya 14'an a Carnameya Cîhanî ya Mafên Sivîl û Siyasî, dadgehîkirin divê bi eşkere û serbixwe be. Lê di dosyayên çalakvanên siyasî di şanoya mafperweriya sîstema zordest de, bêparkirin ji hilbijartina parêzer û piştras bûn bi îfadeyên bi zorî û di bin îşkencê de, pêvajoya han ji dadwerî û wateya mafxwaziyê vala dike.

Guherîna naveroka sûc: Bi pênaseyên sist û şêlû, her cure rexneyek ji sîstema zordest û her bizaveke mafxwaziyê dikeve rêza "Efsad fîl-Eriz" yan jî hewildan li dijî ewlehiya neteweyî de, da ku rê ji bo biryarên darvekirinê xweş bibe.

Hikmên pêşwext: Di vê sîstemê de, civînên dadgehê tenê şanoyeke fermi ne, ji ber ku hikmê desthilatê berê di odeyên tarî yên îfade wergirtinê de ji aliyê berpirs û lêkolînvanên dezgehên ewlehiyê ve hatine dayîn.




Dozgiriya ku emrazê kerbê û dijmindariyê be, her bi xwe sûça herî mezin a li dijî mirovahiyê ye; ji ber ku tê de dozger ne cîbicîkarê yasayê ye, belkî kirêgirtî ye bo cîbicîkirina hukmekî ku li dijî têgeha azadiyê derketiye.

**Sitratejiya nivîşkankirina civakê**

Siyaseta tepeserî û fetisandinê di rêya dezgehe dadweriyê de, ne ji bo rêkxistina cikaka yasa parêz, belkû bi armanca tirsandinê hatiye darêtin. Peyama vê sîstemê ji bo civakê eşkere ye: "Bihayê mafxwziyê, derbasbûn e ji sêpêka daliqandinê". Lê dîroka mafxwazî û yasa parêziyê ev yek selimandiye ku çi dema dadgeh bûne cibexaneya hikûmetekê, wê hikûmetê bi dawiya hebûna xwe ya hiqûqî û exlaqî ragihandiye.

**Gotina Dawiyê**

Renge bikaranîna dadgehê weke çeka desthilatê bikare bo demeke kurt dengê neraziyan bifetisîne, lê sitûnên sîstemê dihejîne û hildiweşîne. Ew xwînên ku di van tribûnên nedadperwerane de tên rijandin, tovê berxwedanê di dilên civakê de diçînin.

Mêhrab, Nasir û Yeqûb, ew nav in ku di hizra giştî ya neteweyekê de dê weke qurbaniyên hikmê sîstema dadperweriya serûbin bûyî de, bimînin. Ew tribûnên ku îro biryara jinavbirina cesteyî ya mirovan didin, bi xwe di pêşberî dîrok û wijdana mirovahiyê de, sûcdarên sereke yên dosiyeyekê ne ku tu rêya revê ji darizandina ji wan re nabe. Dibe ku dadwerî îro di korîdorên dadgehên wan de hatibe hepis kirin, lê rastî hertim pişt deriyên girtî de nahê ragirtin.

# Serdana Mistefa Hicrî bo Parlamentoya Ewropayê



N. Nasike Nesîrî
W. Hesen Mukerem

Roja Çarşemê, 15/04/2026an a Rojî, rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê (PDKI) li Parlamentoya Ewropayê civînek li dar xist. Di civînê de hejmarek rêber û nûnerên neteweyên Îranê û rêberên siyasî ên dijberî rêjîma Îranê, di nav wan de Kurd, Belûç û Ereb, amade bûn.

Serdana rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistanê (PDKI) xaleke bihêz e ku helwesta welatên Ewropî û helwesta Hizba Demokrat nîşan dide. Ev dengek e, dengê neteweyan û azadîxwazan, ku digihîje yek ji platformên siyasî yên herî girîng ên cîhanê.

Di çar dehsalên borî de, neteweyên bê maf û Olî yên jêr sitema Îranê, di nav de neteweya Kurd, ku li gorî piraniya texmînan sêzdeh milyon kesin û ji bilî Kurdan, Ereb, Belûç, Gîlek, Tirkmen û Azerî, bi berdewamî rastî tepeserkirin û zextên sîstematîk ên siyasî, aborî, civakî û çandî hatine. Ev serdan di rastiyê de hewldanek e ku vê rastiyê ji cîhana derve re ragihîne, da ku cîhan ji tiştên ku di hundurê Îranê de diqewimin bêtir haydar bin û bi vî rengî helwesta rast bigire.

Mistefa Hicrî, wekî rêberekî navdar ê tevgera siyasî ya Kurd li Îranê, ne tenê behsa Kurdan kir, lê di heman demê de tekez kir ku pêdivî bi sîstemek nû heye, sîstemek demokratîk, federal û sekular ku bikare hemî cûdahiyan bicîh ji holê rake.

Di civînê de, nîqaşên berfireh li ser rewşa navxweyî ya li Îranê, mafên mirovan û pêwîstiya beşdarbûna hemî beşên civakê di her pêvajoya guhertina siyasî de hatin kirin. Beşdaran tekez kirin ku bêyî rêzgirtina ji cûdahiyên netewî û çandî û bêyî beşdarbûna neteweyên xenî fars, tu guhertinek rastîn nikare bi ser bikeve. Lê li vir pirsek girîng û bi rastî jî hîn bêbersiv heye, heta çi qasekê Ewropa dikare an dixwaze piştgiriyê bide vê axaftinê?

Weke ku xuya dike, bersiv ne hêsan e. Bi gelemperî Ewropa piştgiriyê dide mafên mirovan û demokrasiyê, lê berjewendiyên siyasî û stratejîk jî rolek dilîzin. Ji ber vê yekê, piştgirî pir caran di asta axaftin û zexta dîplomatîk de dimîne.


Her çend ev piştgirî bi sînor xuya bike jî, ew pir girîng e, ji ber ku ew dengê wan kesane ku dengê wan li welatê wan nayê bihîstin, tîne qada navneteweyî. Ev dikare bibe gavek ji bo çêkirina zextek bêtir û piştgiriyek berfirehtir.



Di dawiyê de, serdana Rêzdar Mistefa Hicrî bo Parlamentoya Ewropayê ne tenê serdaneke siyasî bû, Ev sedemeke ku têkoşîna ji bo azadî û demokrasiyê li Îranê bi giştî û bi taybetî li Kurdistanê bûye mijareke navneteweyî.

Têkoşînek ku dengê hemû netewe û aliyên mafxwaz û azadîxwaz dihewîne û hîn jî berdewam dike.

# jîyan di navbera Tirs, bindestî û hêvîya Azadiyê de



N. Sefiye Xalidî



Rewşa Kurdan li rojhilatê Kurdistanê gelek dijwar e. Ew bi berdewamî di navbera zilm û hêviyê de, di navbera tundûtûjî û xwesteka azadiyê de asê mane. Ji bo van kesan, ev tê wateya jiyaneke rojane ku gelek hêz û qewetê dixwaze.

Ji perspektîfeke psîkolojîk ve, rûbirûbûna berdewam a bûyerên neyînî yên wekî girtin, darvekirin û cudakarî dibe sedema streseke kronîk. Gelek kes nîşanên mîna yên nexweşiya stresê ya piştî trawmayê (PTSD) pêş dixin, wekî fikar, pirsgirêkên xewê, an westandina hestyarî.

Di heman demê de, cureyek taybetî ya tengezariya hundurîn derdikeve holê, ji ber ku hêvî û tirs bi hev re dijîn. Geşedanên siyasî an tevgerên protestoyê dikarin hêviya guhertinê çê bikin.

Ev nezelaliya domdar dîtina aştiya psîkolojîk dijwar dike. Bi demê re, trawmaya nifşî jî dikare pêş bikeve, ku tê de ezmûnên zordarî û tirsê ji nifşekî bo nifşekî din têne veguhastin.

Tevî van hemû bargiraniyan, gelek kes berxwedaneke berbiçav nîşan didin.
Ji aliyê siyasî ve, rewş bi berdewamî ya rêjîma Îranê ve girêdayî ye.

Herêmên Kurdî pir caran wekî hesasên siyasî an jî dijber têne dîtin, ji ber vê yekê kontrola dewletê li wir bi taybetî xurt e.

Çalakiyên siyasî, heta yên ku mafên çandî an zimanî dihewînin jî, pir caran têne sînordarkirin an jî krîmînalîzekirin.

Di heman demê de, demên hêviyê dubare dibin, mînak bi rêya tevgerên protestoyê an guhertinên siyasî yên potansiyel.
Ev rewşa bêçare ya siyasî bandorek girîng li ser nifûsê dike û bêhêvîtî û nebûna perspektîfan, nemaze di nav ciwanan de, zêde dike.

Ji perspektîfa mafên mirovan ve, rewşa Kurdan li rojhilatê bi salan e baş hatiye belgekirin.

Rêxistinên wekî Amnesty International û Human Rights Watch bi rêkûpêk li ser girtinên keyfî, îşkenceyê, sînordarkirina azadiya raman û civînê, û cezayên mirinê yên nehevseng rapor dikin.



ferek tirsê diafirînin ku tê de mafên bingehîn nayên garantîkirin.

Ji bo kesên ku bandor li wan tê kirin, mafên mirovan ne têgehên abstrakt in, lê rastiyek rojane ne ku ewlehî û domandina wan diyar dike.

Di demeke dirêj de, civakên ku di bin şert û mercên weha de dijîn stratejiyên taybetî yên lihevhatinê pêş dixin.

Aliyekî vê yekê adaptasyon e: şert û mercên dijwar di jiyana rojane de qismî normalîze dibin da ku şiyana çalakiyê biparêzin.

Di heman demê de, nasnameya kolektîf roleke navendî dilîze. Ziman, çand û dîroka hevpar dibin çavkaniyên girîng ku piştgirî peyda dikin û hesta aîdiyetê xurt dikin. Wekî din, pêşketinên siyasî pir caran bi pêlan çêdibin.

Serdemên hêviyê bi bêhêvîbûnê tên, lê xwesteka guhertinê berdewam dike.

Diyaspora jî roleke girîng dilîze, ji ber ku ew bala navneteweyî diafirîne û dikare zexta siyasî bike, di heman demê de dûrbûnek diyarkirî ji rastiya di hundurê welêt de biparêze.

Rewş bi taybetî ji bo nifşê ciwan dijwar e. Ew bi bêtir agahdarî, perspektîfên gerdûnî û bendewariyan mezin dibin, lê di heman demê de sînorkirinên di nav welatê xwe de nas dikin.

Ev dibe sedema bêhêvîbûnek kûr û pevçûnek hundurîn. Gelek kes meraq dikin çima jiyanek azad û ewle ji hêla yên din ve wekî tiştekî asayî tê dîtin, di heman demê de ji bo wan negihîştî xuya dike.

Ev alozî dibe sedem ku hin kes bibin çalakvanên siyasî, hinên din vekişin, û yên din jî koçberiyê hilbijêrin.

Gelek xebatkarên kurd hatin darvekirin û bi nav û peyamên xwe ji bo nifşên pêşerojê bûne sembola berxwedanê, wekî Mêhrab Ebdullahzade û peyvên wî ê dawiyê"...bi Xwedê, kesê ku li kolanê dimire, ji bo wî gelek baştir e ji wê yekê ku 42 meh, bi milyonan caran bimire û zindî bibe...".

Bi kurtasî, Kurdên rojhilatê Kurdistanê li Îranê di rewşek domdar a aloziyê de di navbera hêvî û rastiyê de dijî.

Ev rewş ji hêla psîkolojîk ve stresdar, ji aliyê siyasî ve alozî û ji perspektîfa mafên mirovan ve pirsgirêkdar e.

Lêbelê, di heman demê de, ew berxwedanek domdar û xwestekek ji bo guhertinê jî nîşan dide.

Dilşikestina nifşê ciwan ne qelsiyek e, lê bertekek têgihîştî ye li hember hêviyên dubarekirî yên nehatine bicîhanîn û neheqiya domdar.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Mêhrab Ebdullahzade, girtiyê şoreşa “Jin, Jiyan, Azadî” li Urmiyê, hat darvekirin

Mêhrab Ebdullahzade, yek ji kesên ku di xwepêşandanên “Jin, Jiyan, Azadî” de li Urmiyê hatibû girtin, hat darvekirin, li gorî raporta Ajansa Mîzan, ku medyaya fermî ya desthilata dadweriyê ya Rejîma Îranê ye, sizaya darvekirina wî bi tohmeta “rolek di kuştina Ebass Fatemiye de” bi ser de hatibû sepandin û hat cîbicî kirin.
Mêhrab Ebdullahzade, welatiyê Kurd, di 30ê Rezbera 1401an rojî di dema xwepêşandanên giştî de, ji aliyê Saziya Îtilaata Spaha Pasdaran ve hatbû girtin. Li gorî raporên hatinî belavkirin, ew bi dirêjahiya 38 rojan di girtîgehê de di bin lêpirsîn û îşkenê de bûye. navbirî di 29ê Xermanana 1403an a rojî de ji aliyê Dadgeha Şoreş ya rejîma Îranê li bajarê Urmiyê ve bi darvekirinê hat sizadan; ev siza paşê jî ji aliyê Dadgeha Bilind ve hat pejirandin. Lêbelê, hîn jî hûrgiliyên pêvajoya dadgehê, wekî hebûna parêzerê serbixwe an şertên wergirtina “îtirafan”, bi awayekî zelal nehatiye belavkirin.
Saziyên mafên mirovî berê ragihandibûn ku Mêhrab ji 8ê Banemera 1405an a rojî û piştî pevçûnek lefizî bi yek ji hêzên nava girtîgeha Urmiyê re, bi fermana serokê girtîgehê bo odeyên takekesî hatibû veguhastin.
Ebass Fatemiye, ku di dosiyeya Mêhrab de weke yek ji hêzên Besîc tê nasandin, endamê Gurdana Beytul-Muqeddes ya taya 24ê Nûşînşehrê bû û di dema tepeserkirina xwepêşandanên sala 1401an de hat kuştin.



Di rapora Ajansa Mîzan de, bêyî ku hûrgiliyên serbixwe yên yasayî bên diyarkirin, tenê bi “îtirafên” Mêhrab hatiye îşare kirin û hatiye îdîa kirin ku ew di dema pevçûnê de çend derib li Fatemiye xistiye.

## Du girtiyên siyasî bi awayekî nihênî hatine bidarvekirin

Sizaya bidarvekirina 2 girtiyên siyasî ku bi tohmeta sîxûrî bo Îsraîlê sizayê bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin, bi awayekî nihînî li girtîgeha navendî a Urmiyê de hate cîbicîkirin.
Dezgeha bi nav dadweriya rejîma Komara Îslamî piştrast kir ku sipêdeha Îro Şemî 12ê Banemerê, 2 girtiyên siyasî bi navên, Nasir Bekirzade û Yeqûb Kerîmpûr, piştî derbaskirina 2 rojan li odeya take kesî de, hatine bidarvekirin.
Eva jî di demekê deye ku berê hoşdarî li ser metirsiya cîbicîkirina sizaya wan hatibû dan.
Nasir Bekirzade, ciwanê temen 26 sal xelkê bajarê Urmiyê, li piroseyek bilez a dadwerî de sizaya wî ji aliyê dîwana bilind a rejîma Îranê ve hatibû piştrastkirin.
Yeqûb Kerîmpûr, derçûyê beşa yasa û welatiyê Turkê Yarsan û xelkê Miyandawê, li dema şerê 12 roje ye Îran û Îsraîlê hatibû destbiserkirin.
Herduk girtî li dema destbiserkirinê de li jêr îşkenceya tund de bûn û bo wergirtina îtirafa bi zorê û bo givaşên zêdetir hevjîna Yeqbûb Kerîmpûr jî hatibû girtin.
Ev cezaye di demekê de hatiye cîbicîkirin ku navendên mafê mirov tekezî li nerohniya piroseya dadgehîkirina wan dikirin.



## Cîbicîkirina sizaya bidarvekirina 3 girtiyên xwenîşandana Befranbarê

Komara Îslamî li dirêjeya pêla nû a bidarvekirinan, sizaya bidarvekirina 3 girtiyên nerizatiya Befranbar li Meşhedê yên bi navên, Mehdî Resûlî, Mihemed Reza Mîrî û Îbrahîm Dewlet Abad, cîbicî kir.
Rejîmê tohmetên çewt ên wekî, Sîxûrî bo Mûsadê, û têkdana ewlehiya Milî, ev ciwan kirne qurbaniya maşîna kuştara xwe.
Merziye Mohîbî, parêzera vê dosyê, eşkere kir ku dezgeha bi nav dadweriyê bi fêl soza derew (Lêborîn)ê, malbatên wan neçar bi bêdenigiyê kiribûn, lê bi bê agehdarkirina berê û piştgirêdan bi ( Îtirafa bi zorê) ev ceza cîbicî kir.
Ev bidarvekirinên siyasî li rewşa şer de, tenê emrazek in bo belavkirina tiresê di nav civakê de.
Komara Îslamî ku li çareseriya kirîzan de çi ji desta neyêt, bidarvekirinê wekî çekekê bo nehiştina neyar û rêgirî li serhildana nû a xelkê bikar tîne



# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (517)